Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1195 14-Tebax-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Pira dostaniya navbera gelan: Aram Tîgran



Navenda Nûçeyan

Hunermend Aram Tîgran, di 15’ê kanûna 1934’an de li bajarê Qamişlo yê rojavayê Kurdistanê ji dayik bû. Di 9 saliya xwe de meraqa wî ji muzîkê re çêdibe. Gava ku bavê wî dibîne meraqa wî ji muzîkê re heye jê re dibêje: “Aram, ka em biçin sûkê ji te re enstrûmanekê bikirin.” Piştre Aram û bavê xwe bi hev re diçin sûkê û enstrûmaneke muzîkê ya bi dilê Aram jê re dikirin. Aram bi vê pir kêfxweş dibe û ji wê rojê ve dest bi lêdana enstrûmanên muzîkê dike.

Piştre her roja ku derbas dibe Aram behreya xwe ya muzîkê bi pêş ve dibe û di nav demê de fêrî cumbûşê dibe. Bi demê re Aram dibe cumbûşvanekî serkeftî. Gava ku Aram dibe 27 salî, sal 1966’an. Aram êdî hunermendekî navdar e û li Radyoya Êrîwanê dest bi xebatê dike.

Aram bi stranên xwe yên “ kurdî yên mîna “Lê lê Rihê, Zimanê Kurdî, Gelê Kurd, Rojbaş Diyarbekir, Ay Dil, Şev Çû, Tûzik, Qedrê Dê û Bavan, Lo lo Pismamo, Bi Hesreta Yerêvanê” û gelek stranên bi zimanê ermenkî, erebî û suryanî dibe deng û rengê Radyoya Êrîwanê. Ji ber vê sedemê gava ku dema saeta Radyoya Erîwanê dihat gelê kurd û ermen bi awayekî bêsebir li benda stranên ku Aram bi dengê xwe yê dawudî distra bûn. Dema ku Aram dest bi stranan dikir, gel bi kêfxweşî guhdariya dengê Aram ê xweş dikir û demên kêfxweş û bextewar derbas dikir.

Aram Tîgran wexta ku ji bo konserekê ji bajarê Amedê yê paytexta dilê hemû kurdan hat paytexta Yewnanistan Atînayê nexweşî lê peyda bû. Ji ber ku xwîn çûbû ser mêjiyê wî û li gel hemû hewldanên bijîşkan jî nikaribû bihata rizgarkirin û di 8’ê tebaxa 2009 an de li Atînayê jîyana xwe ji dest da.

Wesiyeta Aram Tîgran ew bû ku li Amedê were definkirin. Lê hikûmeta AKP’ê bi hincetên dijmirovî ku mirovahiyê ji xwe şerm kir, astengî derxist, destûr neda ku malbat û hezkiriyên hunermend Aram Tîgran wesyeta wî bi cih bînin û li Ameda ku hunemend Aram evîndarê wê bû bispêrin axa bav û bapîran, dayik û dapîran.

Ji ber helwesta rayedarên desthilata AKP’ê malbatê biryar da ku cenazeyê Aram Tîgran li bajarê paytexta Yewnanistan Atînayê bispêre axê. Lê belê gelê kurd wesyeta hunermend Aram Tîgran bi cih anî. Rayedarên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê beşdarî merasîma cenaze bûn û axa ku ji Amedê biribûn li ser gora Aram Tîgran reşandin û soz dan ku dema şert û merc guncav bibin dê li gor daxwaza wî û hezkiriyên wî gora hunermend Aram Tîgran neqlî Amedê bikin.

Em di 14’emîn salvegera koça wî ya dawî de hunermendê mezin pira dostaniya navbera gelê kurd û ermen û hemû gelên Rojhilata Navîn bi rêzdarî bi bîr tînin û bejna xwe li ber bîranînên wî ditewînin.

Oxir be hunermendê gewre!
Em ê tu car te ji bîr nekin.
Tu di dilê me de dijî.

# Hewşa mala xwe kiriye mîna tabloyek hunerî

Navenda Nûçeyan



Nesrîn Nezîr bi çandina giyayên kêmpeyda hewşa mala xwe veguhastiye mîna tabloyekê hunerî. Nesrîn Nezîr Elî (30) li gundê Xirbet El Îd ê Çiyayê Kezwanan ê girêdayî bajarê Hesekê ji dayik bûye. Di 19 saliya xwe de zewiciye û li bajarê Qamişlo dimîne.

Nesrîn a dayika 4 zarokan e, ji zaroketiya xwe ve ji şînkahiyê hez dike. Dema zarok bû di hewşeke biçûk a mala xwe de cureyên cuda yên şînkahiyan diçandin.

Nesrînê piştî ku dizewice jî eleqeya wê ya bi şînkahiyê re kêm nabe. Nesrîn di hewşa mala xwe ya biçûk de zêdetirî 100 cureyên gulan wekî cûrî, nêrgiz, yasmîn, ful û cureyên din ên şînkaniyan çandine.

Nesrîn wekî ku eleqeyê dide zarokan eleqeyê did gulan. Nesrîn got: “Şînkahî mîna zarokan pêwîstiya wê bi eleqeyê heye. Ji bo ku geş û mezin bibe divê her timî eleqe bi wan re were dayîn.”

Li kêleka çandina nebat û kulîlkan, Nesrîn bi xwe qûtiyên gulan ji çemento, plastîk û qimaşan çêdike. Girêdayî vê yekê Nisrînê diyar kir ku qûtiyên plastîkî zêdetir sûdê didin giyayan, ji ber ku ew wek axê oksejînê ji giyayan re peyda dikin. Der barê çêkirina qûtîkan de Nesrîn diyar kir ku ew ji hevalekê xwe fêrî vî karî bûye û wiha domand “Min ev kar ji hevalekê xwe girt. Kî/ê bixwaze ez dikarim qûtîkan ji wan re çêkim. Ji bo fêrkirina wan a vî karî jî dikarim bi wan re bibim alîkar. Min hinek qûtîk ji bo zarokên xwe çêkirin da ku bi wan beşdarî pêşangehên dibistanê bibin. Her wiha ji malbat û hevalên xwe re jî çêdikim.”

Her wiha Nesrînê ser hewşa xaniyê xwe girt da ku germahiya zêde nede giyayan û wan biparêze.

## Bi kamêreya Birûc Resûl



## FERHENGA BIWÊJAN

**Dinya ji ti kesî re namîne:**
- Bi heman wateyê.

**Dinyaya gewrik ji ti kesî re namîne:**
- Bi heman wateyê.

**Dinya ji pêxemberê me re nemaye**:
- Bi heman wateyê.

**Dinya du dergeh e:**
- Bi heman wateyê.

**Dinya pûç û betal e:**
- Bi heman wateyê.

**Dinya xan e:**
- Bi heman wateyê.

**Dinya xewna şevê ye:**
- Bi heman wateyê.

**Dinyaya xwe guhert:**
- Mir; mezixî; koçî wê dinyayê kir; jiyana xwe ji dest da.

**Ev dinya nahêje:**
- Dawiya her kesî mirin e; emê tev bimirin.

**Ez bêpişt mam:**
- Ez mam tenê; ez mam bêxwedî.

)Dema xizmê yekî yê nêzîk dimire, yan tiştekî wî yê girîng winda dibe hingê dibêje)

**Êdî gor gazî dikinê:**
- Êdî yê mirinê ye; li ber mirinê ye.

**Fenera êlê vemirî:**
- Lehengê êlê mir.

**Hestiyên wî riziyane:**
- Ji mêj ve miriye.

**Heta ax nekeve çavê min:**
- Heta ez nemirim.

Heta bavê mirov nemire mirov li ser nagirî:
- Heta tiştek neyê serê mirov, mirov nake qîr û hawar.

**Hindik maye roja wî biçe ava:**
- Li ber mirinê ye.

**Ji nan û avê qut bû:**
- Li ber mirinê ye; êdî nikare tiştekî bixwe.

**Karwanê wî bar kir:**
- Koçî wê dinyayê kir; mir.

**Kezeba wê şewitiye/ceger lê şewitiye:**
- Zarokên wê mirine.

**Kêr negihat ser:**
- Mirar bû; nehat serjêkirin.

**Koça xwe bar kir:**
- Mir; mezixî; koça dawî kir.

Ku min bizaniya wê bavê min bimire, minê **guhê wî tijî genim bida:**
- Ku min bizaniya wê tişteke wisa bibe, ezê li gorî wê tev bigeriyam.


**Lingên wî bûn cot:**
- Mir.

**Lingên xwe radan:**
- Mir.

**Miriyên Qelendera çêdibin pişt re qeliyê diheşînin qûna wan:**
- Heta sax in, heta li cem wan in qîmetê wan nagirin, pişt re qîmet didin wan.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Qehremantiya Denîz Firat gelek Denîz ava kirin’



Rojnamevan û rêhevala Denîz Firat ya tekoşînê, Hîvda Hebûn diyar kir ku tekoşîna Denîz Firat ya şoreşgerî û ragihandinê ji bona jin û civakê giştî bû mînakek herî mezin, şahadeta wê jî bandoriyeke mezin di nav dilê Kurdistanê de da avakirin.**R-2**

## Rizgarkirina Minbic, ji tariyê ber bi ronahiyê ve



Bajarê Minbicê di sala 2014`an de ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hatibû dagirkirin. Pêngava rizgarkirina bajarê Minbicê jî bi coş, kelecan û şewitandina çerşefên reş ji milê gelê Minbicê ve hate pêşwazî kirin. Bi saya berxwedana gelê Minbicê piştî rojên koletiyê û tariyê ronahî ji nûve pişkivî.**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1195 14-Tebax-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# PÊNGAVA 15’Ê TEBAXÊ DESTANA JIYANA AZADIYÊ YE

Di 15’ê Tebaxa 1984’an de Partiya Karkerên Kurdistanê PKK’ê yekem çalakiya xwe ya çekdarî li dijî dewleta Tirk a dagirker pêk anî û bi awayekî fermî şerê çekdarî da destpêkirin. Ev roj di nava gelê kurd de, di kesayeta pêşengtî û berxwedana dîrokî ya fermandar Egîd de wekî destpêka şoreşa vejînê tê pejirandin. Ev pêngav li dijî xiyanet û dagirkeriyê mesaja serhildanê bû, herwiha hemû pilanên hêzên hegemon ên qirkirina Kurdistanê têk bir. Ango tolhildana hezarê salane ya li dijî xeta xiyanet û mêtîngeriyê bû.**R-5**




## Li kantona Cizîrê nîşaneyên paşketina çavkaniyên xwezayî



Nîşaneyên heyî didin xuyakirin ku çavkaniyên xwezayî li kantona Cizîrê bi paş ketine. Pisporan bal kişand ser polîtîkayên avê ku dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmê dimeşîne û got ev polîtîka ji bo ewlehiya xurekê û cihêrengiya biyolojîk û siberoja herêmê xeternak in.**R-6**

## Ji çiraxa huner û wêjeya kurdî Huermend Ednan Ibrahîm



Hunermendê dengê şoreş, evîn û aştiyê Ednan bavê Hêco stranbêj, bestekar û awazkarekî kurd e, di destpêka jiyana xwe de, bi nêrîn û meylên xwe yên siyasî û neteweyî yên ku rasterast bi huner û muzîka wî ve girêdayî bûn.**R-7**

## Dîroka PDK’ê ya dagirtî bi xiyanetê... (Rojhilatê Kurdistanê)

PDK’ê ji dîroka avabûna xwe ve û heta niha xeta xiyanetê berdewam dike, çi hêzeke şoreşgerî li Kurdistanê derkeve PDK’ê şerê wê dike û hewil dide wê tesfiye bike. Li Rojhilatê Kurdistanê jî çekdarên PDK’ê bi fermana Mela Mistefa Barzanî ji bo razîkirina şahê Îranê bi 10’an şoreşger û pêşengên Rojhilatê Kurdistanê qetil kirine.**R-3**



Konferansa Sosyolojiya Azadiyê — Nehîr pale — R-2
Gêrîlayên Egîd — Farûk Sakik — R-5
Israra di plana Dêrazor û Kaosê de — Zekî Bedran — R-5
Wêjeya jinê yan jinên wêjevan — Kemal Necim — R-7

# ‘Qehremantiya Denîz Firat gelek Denîz ava kirin’

Rojnamevan û rêhevala Denîz Firat ya tekoşînê, Hîvda Hebûn diyar kir ku tekoşîna Denîz Firat ya şoreşgerî û ragihandinê ji bo jin û civakê giştî bû mînakek herî mezin, şahadeta wê jî bandoriyeke mezin di nav dilê Kurdistanê de da avakirin.

**Argêş Gewda/Qamişlo**



Dîroka 6‘ê Tebaxa 2014‘an de çeteyên DAIŞ‘ê êrîşek terorî li ser Wargeha Şehîd Rustem Cudî ya Mexmûr pêk anîn. Di encama êrîşê de jî rojnamevan û şoreşgera kurd Denîz Firat jî şehîd bû.

Di derbarê jiyana şoreşger û rojnamevan Denîz Firat de, rêhevala wê ya tekoşînê û hempîşeya wê Rojnamevan Hîvda Hebûn ji rojnemeya me re axivî.

### Denîz Firat bi hevaltiya xwe re pir girêdayî bû

Hîvda Hebûn diyar ku tevahiya aliyên jiyana şehîd Denîz bala mirov dikşîne û wisa dest bi axiftina xwe kir: “Di dîroka 2011’an de li qadên Parastina Medya ji aliyê dijmin ve êrişên pir dijwar çêdibûn. Taybet li ser heremên wek Xakûrkê û Xinêre rojane êriş pêk dihatin. Ji aliyekî ve êrişên dewleta Îranê her roj li ser herema Xinêre çêdibûn û di aliyê din de jî li Xakûrkê rojane ji aliyê dewleta Tirk ve êrişên hewayî çê dibûn. Giştî hêz 24 saetan di nav tevgerê de bûn. Êrişên ku di despêka biharê de destpê kiribûn, heya zivistanê jî berdewam kirin. Kesên ku taybet li Xinêre mane dizanin ku payîz û zivistana wê çiqasî dijware. Li ruxmê wê jî giştî hêzên ku Xinêre û Xakûrkê neketibûn kampên zivistanê. Piraniya hêzê heya dawiya payîzê hêja cihê xwe yên zivistanê amade nekiribûn. Yek ji wan jî tabûra me ya Arê bû. Wek tabûr em li wê qadê diman. Êdî dawiya payîzêbû û li arê berfê dest pê kiribû. Gelek cih êdî di bin berfê de mabûn. Tabûrê nû dest bi amadekirina kampa zivistanê kiribû. Her roj ji destpêka berbangê heya êvarê me kar dikir ji bo ku em di demek lez de kampa xwe ya zivistanê xilas bikin. Rojekî berbangê em çûn ser kar, êvar de berf barîbû, cihê me kolandibû giştî di bin berfê de mabûn. Dema me hewl dida ku em berfê paqij bikin, me dît berpirsiyara yekîneya me hevala Avşîn û li gel wê jî du heval ber bi me ve tên. Hevalek jin û hevalekî xort bûn. Di destê hevalê xort de wênekêşek hebû û di destê hevala jin de jî kamîreyeke video hebû, kamereya xwe ji destikê wê girtibû û ber bi me ve dihatin. Dema gihiştin me silav dan piştre yêkser wê hevala jin kamereya xwe vekir û karê me dikir dikêşand. Di aliyekî ve jî ji hevala berpirsiyara yekîneyê pirs dikirin. Pirsên wê giştî li ser ewlekariyê, li ser şêwazê kampê û ji bo rewşek heyî wê çawa bikaribin xwe biparêzin bû. Her pirsek ji heval dikir, kamîreya xwe dizvirand li ser cihekî din, hevala Avşîn dema dest bi bersiva pirsên wê dikir wê jî di aliyekî ve dîmenên me dikişand. Wan deman me hevalên ragihandinê zêde wek leşker nedîdît. Me wisa dizanî ku ev heval ji gerîlatiyê û ji şer fem nakin, dema ku wê ew pirs dikirin bala min çû ser wê, ji min re gelek balkêş hat.”

### ‘Tevgerê ew dişande kîjan erkê, ew herdem amade bû’

Hîvda Hebûn di dewama axaftina xwe de behsa fedekariya Denîz Firat kir û wiha pê da çû: “Heya ku wan karê xwe xilas kir û çûn bala min her ser wê hevalê bû. Bi giştî hevalan re nîqaşên wê, pirsên ku ji hevalan dikir, rehet nêzîkatiya wê ji hevalan re heya roja îro jî di bîra min de ye. Ez dikarim bêjim ku yekemîn nêrîna min li ser hevalên ragihandinê dema ku min ew heval dît hat guhertin. Ji Xinêrê heya Arê meşiya bûn. Ev jî dihat wê wateyê ku herî kêm 2 û 3 rojin di rê de ma ne. Him despêka zivistanê bû, pir sarbû, him jî her roj bi dijwarî êrişên dijmin çêdibûn. Lê ew ji bo ku tenê hin kêliyên me yên jiyanê bikêşîn ewqas rê û xeterî dabûn ber çavên xwe û hatibûn. Naskirina min ya heval Denîz Firat di despêkê de bi vê şêwazê çê bû. Piştî demekî di sala 2012’an ez jî derbasî karê ragihandinê bûm. Ji bo wê payîza 2012’an ez derbasî herêma Garê bûm. Cara duyemîn min hevala Denîz li wir careke din dît. Ji xwe zivistanê em bi hev re di kampekî de man. Lê wê zivistanê me zêde bi hev re dem derbas nekir. Ji ber hevala denîz her tim di nav tevgerê de bû. Ew û hevalên ku bi hev re kar didan meşandin piranî li qadan bûn û dema ku li kampê bûya jî heya derengiya şevê kar dikirin. Em jî ji ber nû çûbûn wî karî zêde me heval nedîdît. Bihara 2013’an ez û hevala Denîz bi hev re derbasî kampa Ş. Rustem Cudî bû.”

### Derbasbûyina Denîz kelecanek mezin di nav gelê Wargeha Şehîd Rustem Cudî de ava kir

Hîvda Hebûn wisa li axaftina xwe zêde kir: “Denîz, zaroka wê kampê bû. Ji ber ku malbata wê di salên 90’î de koçber bibûn, li kampê jiyan dikirin. Kampa Mexmûrê giştî heval nas dikirin û pir jê hiz dikirin. Dema ku agahiya gel çêbu ku wesazîya Denîz jibona çêbuye her roj malekî ew bangî malê dikir. Gelek welatiyên kampê jî, ji bo çareserkirina pirsgrêkên xwe jî dihatin gel Denîz. Ji xwe pir zêde nema êrışên çeteyên DAIŞ li li ser Iraq û Başûrê Kurdistanê jî dest pê kir. Di nav kampê de jî amadekariyên êrişên DAIŞ dihat kirin. Ciwanên Mexmûr komên parastinê amade dikirin. Ji Herêmên Parastina Medya ji ji bona hemberî êrîşên DAIŞê hêzên parastina hatibun wesazîkirin. Di wan deman de DAIŞ’ê êriş bir ser Şengalê, Denîz ji bo ku xwe bigihîne gelê wir û herî kêm bikaribe însanan xilas bike ketibû nav hewldanan. Li ser telefonê xwe digihand gel û ji bo ku xwe bigihînin hevalan alîkariya wan dikir. Heya ku gel digihiştin cihê ewle Denîz nedisekînî. Ji xwe demek derbas nebû êdî êrişên DAIŞ’ê li aliyê kampê jî dest pê kir. Çeteyên DAIŞ’ê demek pir kin de xwe gihandin derdora kampê, pêşmergeyên PDK’ê cihên xwe giştî berdabûn, ji ber wê jî çeteyên DAIŞ’ê di şevekî de xwe gihandin nêzî kampê. Piştî ku gel bi giştî ji kampê hat derxistin, hêzê ewlekariyê û komên ku ji mîlîsên Mexmûrê pêk dihatin ji bo ku kampê ji DAIŞ xilas bikin vê carê kamp dorpêç kirin. Heval Denîz jî bi wan koman re tevger dikir. Di her gavê de bi wan re bû. Yek deqeyekî jî ji wan qut nedibû. Dema em gihiştin tepeyên li ser kampê, Denîz jî nû ji çalakiyê hatibû. Ji ber ku hêz hijmara xwe kêm bû, piraniya wan mîlîs û ciwanên kampên bûn, cepxaneya wan pir sînordarbû. Ji ber wê jî êvara grûbên piçûk diketin kampê çalakî dikirin. Denîz jî bi wan re her carê diçû. Batariya kameraya wê nemabû, batarî ji me girt û wê kêliyê de hevalekî xort hat jê re got pêşmergeyan doçka anîne, nizanîn daynin, ka we re em jî biçin gel wan. Piştî ku ew çûn çend deqe derbas nebû, pevçûn dest pê kir. Di navbera me û wan de bi qasî 30 metreyî hebû. Çeteyên DAIŞ’ê êriş dest pê kirin, çekdarên PDK’ê dema ku dîtin DAIŞ’ê êriş kirin yekser erebeyên xwe sûwarbûn û reviyan. Ji xwe çeteyan destpêkê êrîş li ser koma ku heval Denîz nav de ye de kiribû û heval Denîz û du hevalên xort birîndar bibûn. Hê pevçûn berdewam dikir hevalan, Denîz ji nav pevçûnê derxistin û şandin. Me dizanibû ku heval Denîz birîndare, piştî sê rojan agahî gihişt ku şehîd ketiye.’”

### Şahadeta Denîz Firat li ser ciwanên kampê bandoriyek mezin da avakirin

Hîvda Hebûn axiftina xwe de cangorîyên hemberî êrîşên DAIŞ‘ê şer kirine û şehîd bûne bibîranî û axiftina xwe wisa dawî kir: “Bandora şahadeta heval Denîz di heremê û taybetî li ser gelê Mexmûr bandorek pir cuda kir. Denîz zaroka wê kampê bû û him jî ji bo ku wan ji DAIŞ’ê biparêze xwe feda kiribû. Piştî ku ciwanên mexmûr pê hisiyan ku Denîz şehîd ketiye bi sedan ciwan berê xwe dan qada şer. Heya mirovên temenê xwe mezin jî hatin çek rakirin. Niha li kampa Mexmûr gelek zarok navê Denîz rakirine. Denîz bi tekoşîn, kesayet, hevaltî û sekna xwe ya fedakar ve li di nav gelê Mexmûr de bû sembola berxwedaniyê û ev heya roja îro jî berdewam dike. Denîz çavên xwe di nav şer û koçberiyê de vekir. Wê dijwarî û zilma dijmin di temenek pir piçûk de nas kir. Li hember dagirkerî, îxanet û bê rûmetiyê tekoşîn bide da û ev soza xwe heya kêliya jiyana xwe a dawiyê bê teredût pêk anî.’”

## Ji Pênûsa Jin

### Konferansa Sosyolojiya Azadiyê

**Nehîr Pale**

Li ser xaka Sûriyê û gelek dewletên ku cîranên wê ne şer çêdibe, di van pevçûnên siyasî, bîrdozî, leşkerî û aborî de jin li aliyekî namîne û bixwe jî rewşê ji hemû aliyan ve dinirxîne. Bi taybet li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştî şoreşa Rojava destpê kir jin mîna berê dûrî pêşveçûnan namîn in, êdî derfeteke mezin heye ku rewşa Herêma xwe û tevahiya Sûriyê nîqaş bikin. Ji hemû Kantonên Herêmê lihevdicivin û rewşa jin û civakê dinirxîn in. Çalakî, dewreyên perwerdê û hemû xebatên jin di çarçoveya têkoşîna li dijî zayendperestiyê de tê kirin.

Konferana Sosyolojiya Azadiyê jî yek ji civatên ku jin tê de pirsgirêkên civakî nîqaş kirin. Amadekariya Konferansê du mehan berdewam kir. Berî Meclisa Kombûna Jin a Zenûbiya konferansê lidarbixe meha Gulanê û Pûşbirê komên xwendina parêznameya Sosyolojiya Azadiyê ya Rêber Abdullah Ocalan birêxistin kirin. Hejmara komên li Kantona Dêrazor, Tebqa, Reqa û Minbic hatibûn birêxistinkirin gihîştin 14 koman.

Konferansê bi dirûşmeya `Hezkirina min bi jiyankirina fikrên min pêk tê` hat lidarxistin. 300 jin ji hemû pêkhateyên Kantona Minbic, Tebqa, Reqa û Dêrazorê beşdarî Konferansê bûn. Konferans li ser du mijaran hat birêvebirin. Mijara yekemîn bi sernavê `Di çarçoveya Sosyolojiya Azadiyê de em ê pirsgirêkan nîqaş bikin` destpêkir. Di vê mijarê de girîngiya zanista civakî bi riya nêrînên Rêber Abdullah Ocalan ên di parêznameya Sosyolojiya Azadiyê de hat îfade kirin. Her wiha pirsgirêkên civakî yek bi yek ji aliyê beşdarvanên Konferansê ve hatin nîqaş kirin û têkilidarî wê çareserî çiye, nêrîn û pêşniyar hatin kirin.

Mijara duyemîn jî bi sernavê `Yê azad li pişt dîwarên girtîgehê ye` destpê kir. Di vê mijarê de li dîrokê vegeriyan, têkoşîna gelan û bi taybet a jinê ji bo azadiyê nirxandin. Têkoşîna bi salan ji aliyê gelên bindest ve tê kirin azadî bi wate kir û nirxê wê parast. Her wiha şaş fêmkirina têgeha azadiyê û bi rêbazên şaş daxwaza azadiyê kirin hat şîrove kirin. Jinên ku nêrînên xwe di konferansê de anîn ziman gotin azadî ne di şekil de ye û divê em weke jin di fikir û ruh de xwe azad bikin da ku em rast bijîn.

Piştî ku her du mijar bi dawî bûn, encamnameya konferansê hat dayîn. Yek ji xalên encamnamê ew bû ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan jin têkoşîn û çalakiyên xwe berdewam bike. Di çarçoveya hemleya `Ji bo Rêber APO azadî ji bo pirsgirêka Kurd çareserî` wê mîhrecan were birêxistin kirin.

Her wiha Meclisa Kombûna Jin a Zenûbya wê dest bi rêxistin û xwendina parêznameya çaremîn a Rojhilata Navîn bike. Ji bo avakirina malbata demokratîk xebatên piratîkirina zagonên malbatê berdewam bike. Zagonên malbatê di nava civakê de piratîkirin rêbazê herî girîng ê têkoşînê hat diyar kirin. Her wiha wê têkildarî parastina ekolojiyê dest bi hemleyên zanistkirina civakê bikin. Jinên ku bi ramanên xwe beşdarî konferansê bûn civateke gelekî dewlemend sazkirin. Konferans coş û kelecana hest û fikarên jinê zindî kir. Li wê civatê ji aliyê jinan ve çareserî hat nîqaşkirin û biryardariya xwe ji bona erkên ku dikevin ser mile wan raber kirin.



# Ji çiraxa huner û wêjeya kurdî Huermend Ednan Ibrahîm



**Can Yûsif**

Hunermendê dengê şoreş, evîn û aştiyê Ednan bavê Hêco stranbêj, bestekar û awazkarekî kurd e, di destpêka jiyana xwe de, bi nêrîn û meylên xwe yên siyasî û neteweyî yên ku rasterast bi huner û muzîka wî ve girêdayî bûn, hatiye naskirin û karîbû şêwazeke stranbêjiyê ji bo xwe bi afirîne ku ji nifşê xwe yê hunermendan cuda be.

Ednan Ibrahîm di nav kesayetên welatê me yê delal de kesayetek bi rûmet e, xwediyê resenbûn û dengekî xweş û xemgîn e, kurê bajarê evîn û aştiyê ye, çavkaniya nivîskar û hunermendan, sengera şêr û lehengan, bajarê Dêrik, bûka Cizîrê ye.

Dema ku tê behskirin li ser hunermendekî bi hest, raman û bêhnxweş mîna Bavê Hêco, pênûs, raman û hîs lawazbûna xwe di derbirîn û xweşikbûna gotinan de radighînin, ewî dizanîbû çawa ku şoreş û evînê bi deng, awaz û hunera xwe di nava zehmetiyên herî dijwar de kombike, dema ku gelek hezkiriyên hunera Kurd nikarîbûn straneke Kurdî bibêjin û beşdarî çalakiyên hunerî û siyasî bibin, di bin siya rejima Baasê ya sitemkar de.

Hunermend, bestekar û nivîskarê kurd Ednan Îbrahîm bavê Hêco di 25’ê Cotmeha sala 1969’an de li bajarê Dêrikê ji dayîk û bavekî kurd hatiye dinê, bavê wî “Mihemed û dayîka wî Qemerî ” kurê herî biçûk di nav heşt zarokên malbatê de ye ku (sê xort û pênc keç) bûn. Ew li navenda bajarê Dêrikê, di navbera xirbeyên Qijleya Fransî de, li kêleka çemê Dêrikê, Gola Mele Hamid, û çemê Bacirîqê, li ber şirikên kaniya eskerî û Xumxuma dengê wê, mezin bû, li ber vîzevîza bayê darên bexçeyên nadirê û çîvçîva çivîkan di nav bexçeyê Necim û di hundir malbateke dilnizm de ku comerdî, resenî û nirxên netewî pê dihate nasîn mezin bûye, xwendina xwe li bajarê Dêrikê qedand, qonaxa seretayî li dibistana Nazim Tebeqcelî, ya navîn li dibistana Yûsif El-Azme û ya amedeyî jî li Dibistana Pîşesazî li Dêrikê xwendiye, xewna wî ew bû di wê demê de, ku derbasî Enstîtuya Muzîkê bibe, lê bi wê yekê dilşa nebû, lewra tevlî Enstîtuya Navendî ya Pîşesazî li bajarê Hesekê bû.

Hîn di dibistana navîn de, dest bi karê xwe yê hunerî kiriye bi nivîsandina helbestan bi zimanê erebî, lêxistina tembûrê û fêrbûna baglamê li ber destê şehîd Haşim Keleş û di qonaxa dibistana amedeyî de gelekî bi stranên gelêrî û filoklorî yên kurdî bi bandor dibe û hest û henasên netewî zêdetir li cem wî pêş dikeve, di wê demê de dest bi nivîsandina helbestên kurdî û danîna stranên şoreşgerî dike, ji ber wê jî dev ji stranbêjî û nivsandina bi zimanê erebî ber dide û li şûna wê stran û nivîsên zimanê dayîkê datîne.

Hunermend Ednan bavê Hêco di hevpeyvînên xwe de dibêje:

Ez gelekî ketim di bin bandora stranên gelêrî û filoklorî yên kurdî de û ew ji bo min bûn wek kaniyekî diherikî, min li stranên Ebdil Ezîzê Simê, Îbrahîm Baneqesrî, Reşîd Elanê guhdarî dikir û her wiha jî min ji stranên hunermend Mihemed Şêxo, Erdewan Zaxolî û Seîd Yûsif pir hez dikir û guhdarî dikir, wê demê hestê min yên netewî geş bû û min dest bi nivîsandin û çêkirina stranên şoreşgerî û welatparêzî kir.

Hunermend Ednan bavê Hêco yek ji damezrînerên Koma Cûdî ye ku di sala 1987 ‘an de li herêma Dêrikê hatiye damezrandin û bi komek hunermendên hêja re di Koma Cûdî de tevlî gelek şahî û pîrozbahiyên netewî yên wek Newrozê bûye, mîna: (Şehîd Haşim, Şehîd Emîn Sofî û hunermend Nîhad Diyab, Nizar Hecî Yûsif, Ciwan Sebrî, Hesen Dêrikî, Şezad Resûl, Ferhan Ezeb,Azad Nûredîn, nemir Şêx Zêdan û hunermend Şîlan Şernexî, Sebrê Torî û Dilber Omer û çend stêrkên şanogeriya Dêrikê wekî “şanogerê komîdî Mihemed Ebû Elî, Sekvan torî, Ebodê,Hisên Tahir û nemir Mihemed Hecî Casim”, û komek helbestvan wek Yûsif bavê Ceger, “Diljan Cûdi”, Melevan Rasûl, Mihemed bavê Fener, û Ciwan Mela Alî re beşdar bûye.



Hunermend Ednan bavê Hêco deryayeke dan û kanîyeke ku tu carî zuha nabe, ji çavkanî û pinarên hunera wî gelek hunermendên mezin av jê vexwarine, gelek awazên stranan danîne ku mezintirîn stêrên hunerê strandine yên mîna hunermend: (Sîmar, Mem Ararat, Cemal Sadûn, Ednan Seîd, Husên Şakir, Azad Feqe, Mustefa Xalid, Ronî Cezrawî, Nîhad Yûsif, Azad Nûredîn, Emîn Nadir, Rakan Elanê û Bengîn Cezîrî tevî gelek hunermendên din)

Her wiha ji bo gelek komên hunerî jî nivîsiye û awaz çêkirine wek:( Koma Berxwedan, Koma Ahîn, Koma Cûdî, Koma Serhildan, Koma Wanê).

Şarezayiya hunermendê me Bavê Hêco tenê di nivîsandina helbest û stranan de sînordar nebû ye, lê bi dehan stran ji bo Kurdistanê, ji bo azadî, ji bo aşitiyê, ji bo zarokan, ji bo evîn û hezkirinê, bi dengê xwe yê xweş û awazên xwe yên şêrîn gotine, heft albom ji awazên xwe belavkirine, wî gotinên piraniya stranên xwe ji helbestên helbestvan Diljan Cûdî û ji hin helbestên helbestvanên mîna (Melvan Resûl, Îbrahîm Cangîr û Mihemed bavê Fener) hilbijartiye, her wiha ji dîwanên helbestvanên mezin ên wekî Melayê Cizîrî û Cegerxwîn jî hin helbest çêkirine.

Ednan bavê Hêco di nîveka salên heştiyê yên sedsala bîstan de dest bi karê hunerî kir û bi gotin û awazên xwe û ji bilî dengê xwe yê xweş bi lez û bez karîbû xwe bigihîne dilê gelê xwe.

Ji girîngtirîn kar û berhemên wî yên hunerî ev in:

Heft albûm ji aliyê wî ve hatine çêkirin Zêdetirî 200 stran çêkirine, ji bilî nivîsandina gotinên zêdetirî pêncî stranan .

Di nav stranên wî yên herî navdar de, ku ji hêla hunermend û komên hunerî yên mezin ve hatine gotin:

1- Destana Ava Mizin ya bi navê “koma Cûdî” bi dengê hunermend Nîhad Diyab.
2-Ey Rojava “gropek ji hunermend û stêrkên Dêrik ê”
3-Çîçekê: Sîmar û Mem Ararat
4- Dermana tu nedeyne: Cemal Sadûn
5-Dr. Kendal: Şêrîn Akaş
6- Xweska Li zozana: Azad Feqe
7-Delberê Dilber: Emîn Nader
8- Omer Axa: Ronî Cezrawî
9-Destê evînê Ket dilê min: Ednan Seîd
10 Xalo Xalo: Mistefa Şaker
11- Berxwedan xweş doze: Koma Berxwedan
12- Xanim Xanim: Nîhad Yûsif
13-Ax lê Êma: koma Ahîn .
14-Wey li min: Mesûd Cezîrî
15- Feleka xayîn: Nihad Diyab

Ji ber xebatên xwe yên hunerî û çandî, rastî gelek zehmetî û zextên rêjîma Bais a Sûriyê hat, û ji ber girêdan û pabendbûna wî bi huner, mûzîk û komên hunerî ve jiyaneke feqîr derbas kir, ji ber wê yekê neçar ma ku koçî derveyê welat bibe. Di sala 2009’an de û ji berî ku ber bi Siwêsreyê ve here, hezkiriyên xwe û welatê xwe yê ku jê hez dikir li dû xwe hiştin û



zehmetiya sirgûnê bi hesreta dîtina welatê xwe û hogirên xwe jiya û agirê hesret û bêrîkirina axa welat û bajarê Dêrikê dilê wî disojand.

Rêhevalê wî û sebra wî tenê têlên tembûra wî û tîpên helbestên wî bûn, wan hemû zextan vîna wî (îradeya wî) neşikandin û hewesa wî ya ji bo huner û muzîkê kêm nekirin û li wir keçek ji bajarê xwe bi navê xanim (Eyşe Seîd) nas kir û di sala 2015’an de zewicîn û du zarok ji wan re çêbûn (Mihemed û Noşa) .

Hunermend Ednan bavê Hêco karîbû şêwazeke stranbêjiyê ya taybet ji xwe re çêbike da ku wî ji nifşê xwe yê hunermendan cuda bike.

Ew li ser depê şanoyên herî navdar derket û bi stêrkên hunerî yên mezin re stran gotin û hebûnek berbiçav pêk anî, gelekî têkoşîn kir û navê xwe li ser singa zinaran nivîsand, di demeke dijwar de ji bo ku bikare nasnameya xwe ya hunerî bide îspat kirin,

Wî karîbû di bîrdanka hunera kurdî de şopeke zelal bihêle û stranên wî bi awayekî berbelav li ser zimanan hatin vegotin û di nav girseya kurdî de hebûneke baş tomar kir. Ji ber ku ji welatê xwe û gelê xwe hez dikir û bi saya wan ji xelkê û mirovatiyê jî hez dikir, ji bo hemûyan bi eşq û evîn,bi dilpakî , duristî û hezkirin stran digotin, lewma jî heman hezkirin û heman durustî lê vegerandin.

Ji ber ku stran li cem wî gotineke rast û xweş bû û baştirîn rê bû ji bo rizgarbûna ji her cure êşan û çûna ber bi cîhanek firehtir, azadtir û bextewartir ji ber ku stran ji bo wî sirûda rizgarbûna ji nîrê bindestiyê û rizgarbûna ji koletiya demdirêj a ku Kurd pê êşiyabûn û ew kiribûn qurbanê stemkariyê. Wî baş dizanîbû ku mûzîk destlêdana pencereyên giyan dike, di hundurê wê de bihna aramî û kêfxweşiyê belav dike, û ew yekane rê ye ku dikare tiştan himbêz bike ku destên me nikarin wan hembêz bikin. Hêviya serkeftin, afirîneriyê û pêşketinên zêdetir jêre dixwazim. Ji mîrasa wî ya edebî, hunerî û çandî re mayende û berdewamî.

## Têbînî



### Wêjeya jinê yan jinên wêjevan

**Kemal Necim**

Wêjeya jinê yan jî wêjeya femînîst têgehek e ku pir lêkolîn û vekolîn li ser hatiye kirin. Her çiqas lihevhatinek û nêrîneke hevbeş der barê vê têgehê de çênebûye jî, lê di bingeha xwe de bi têkoşîna jinan a ji bo bidestxistina mafên xwe û parastina statû û ramanên xwe ve girêdayî ye.

Lê hin derdor têgîna “wêjeya jinê yan wêjeya femînîst” napejirînin û dibêjin ku wêje her wêje ye, her çiqas şêwazên wê yên vegotinê û taybetmendiyên cuda bin jî.

Weke tê naskirin, wêjeya ku ji hêla jinan ve hatiye hilbirîn û afrandin wekî “wêjeya jinan” tê binavkirin, ku ev ravekirinek tenê ji bo wêjeyê tê gotin, lê ji bo hunerên din ên wekî sînema, peykersaz, hunera şêwekarî, stranbêjî û hilberên din ên afirîneriyê nayê gotin, ti carî di medyayê de nehatiye gotin sînemaya jinan an şanoya jinan yan jî şêwekariya jinan, lê tenê ji bo wêjeyê hatiye gotin.

Hin sedemên din jî hene ku ev têgîna wêjeya jinan derketiye û pêşketiye, yek ji wan jî dîrokî ye, girêdayî veguherînên civakî ku sedsalên 18 û 19`an de li welatên rojava rû dan.

Di wê demê de nivîsên ku dixwestin hebûna jinan di qada wêjeyî de zêde bikin derketin, ji ber ku jin di wê demê de bi awayê sîstematîk dihatin paşguhkirin û weke afrêner nedihatin nasîn, ji ber ku mêr û civak jî di wê baweriyê de bûn ku pêwîste rola jinan tenê guhpêdana malbatê be. Lê wêje bi xwe, wekî hunereke taybet, ji bilî nirxa xwe ya afirîner, pir hewil dide ku cîhanên hundurîn ên mirovî yên, hest, nakokî û şikestinan eşkere bike, ango wêje ew tiştên ku civak naxwaze eşkere bibe diyar dike. Lewma wilo dihat bawerkirin ku vegotin û nivîsên jinan dê wan kevneşopiyên civakê bihejînin.

Li gorî hin danasînan, hemû wêjeya ku jin dinivîsin navê wê wêjeya jinan e, lê wêjeya famînîst ew wêjeya ku mijara wê bi xwe jin be, ango behsa êş û kêşe û cîhana hundirîn û hestên jinan dike.

Di qada wêjeya Kurdî de heta niha arîşeyeke wiha nebûye cihê gengeşe û gotûbêjan, ji ber pir sedeman, yek jê ew e ku li beramberî mêran hijmara jinên wêjevan kêm bû, niha jî kêm e. Ya din, wêjeya ku jinên kurd nivîsiye û dinivîse ewqas kûr nebûye ku êdî li xweseriya xwe ya jinbûnê bigere.

Di salên dawî de, li nava kurdan têkoşîneke xweser a jinan di pir qadên jiyanê de xwe dide pêş, ev têkoşîn di bin siya têgîna azadiya jinan de pêş dikeve. Vê têkoşînê ta astekê bandora xwe avêtiye ser qada wêjeyê jî, ne tenê wêjeyê lê belê hin beşên ên hunerê jî. Li Rojava di çend salên dawî de mihrîcan û çalakiyên bi sernavê (Wêje û Hunera Jinan) têne lidarxistin, ku tenê ji bo pêşandana afrêneriya jinan têne lidarxistin. Her çiqas ast û naveroka hilbirîna wêjeyî û hunerî ya jinan negihiştye astekê ku bibe şepêleke balkêş û xwedî taybetmendî, lê wek têgîn û boçûn teşeya xwe girtiye û êdî tişteke navê wê wêje û hunera jinan peyda bûye. Ji ber ku ev hewldan di bingeha xwe de mijareke têkoşîna ji bo azadî, xweserî û xwebûnê ye, dibe ku di nava çend salan de pêleke hilbirîna wêjeyî û hunerî ya jinan pêş bikebe û têkeve dîroka wêjeya mirovahiyê.

# Li kantona Cizîrê nîşaneyên paşketina çavkaniyên xwezayî

Nîşaneyên heyî didin xuyakirin ku çavkaniyên xwezayî li kantona Cizîrê bi paş ketine. Pisporan bal kişand ser polîtîkayên avê ku dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmê dimeşîne û got ev polîtîka ji bo ewlehiya xurekê û cihêrengiya biyolojîk û siberoja herêmê xeternak in.

**Navenda Nûçeyan**

Li gorî rapora meha Adara par a Bernameya Jîngehê ya Neteweyên Yekbûyî (UNEP) "Aboriya cîhanê çavkaniyên xwezayî zêde xerc dike. Bikaranîna çavkaniyên xwezayî dê di 50 salên bê de 3 qat zêde bibe. Bikaranîna bê ser û ber bandorê li hêza çavkaniyan a xwenûkirinê dike û hevsengiya xwezayê xirab bike û zirarê dide jîngeha xwezayî."



demê de polîtîkayên pîşesaziyê dibin sedema aloziya avhewayî û bilindûna pileya germahiyê. Vê jî bandoreke mezin li van çavkaniyan kir. Her wiha kiryarên mirovî yên xirab jî dibin sedema kêmbûna çavkaniyên xwezayî."

Silêman têkildarî rewşa li kantona Cizîrê jî got: "Di salên dawîn de qadên heşîn gelekî kêm bûn. Sedema vê yekê birîna daran û kolandina bîran e. Di encama kêmbûna baranê û hişkesaliya çend sal berê de çavkaniyên avê bûn. Di encamê de guhertineke mezin di xwezaya axê de çêbû. Di heman demê de ji ber belavbûna jeneratorên ceyranê û zêdebûna erebeyan hewa jî pir qirêjî bû. Ev hemû nîşaneyên hebûna krîzeke xwezayî ne."

### Rewşa çavkaniyên xwezayê li kantona cizîrê

Kantona Cizîrê bi çavkaniyên xwe yên xwezayê wek depoya xurekê ya welat tê naskirin. Li gorî saziyên têkildar, li herêmê çavkanî gelekî kêm dibin.

Endamê Gerînendetiya Çavdêriya Jîngehê ya Desteya Jîngehê ya Kantona Cizîrê Munzur Silêman diyar kir ku li herêmê kalîteya çavkaniyên xwezayî wekî av, ax, hewa, kêm dibe û sedema vê jî wiha şîrove kir: "Serkaniyên tevahî çeman li Tirkiyeyê ne. Dewleta Tirk ava çeman kêm dike an jî dibire. Di encama vê yekê de rêjeya ava çem, gol û bendavan ku çavkaniyên çandinî û avê ne, gihaştina astên jêrîn. Ev yek jî rasterast dibe sedema bêkalîtebûna axê û kêmbûna heşînahiyê. Di heman

### Çavkaniyên avê

Li kantona Cizîrê bendav wek çavkaniyên sereke yên avê tên dîtin. Li kantonê 10 bendav hene. Çavkaniyên tevahî bendavan jî ew çem in ku ji Bakurê Kurdistanê tên û dewleta Tirk kontrol dike. Di bendavan de milyarek û 16 milyon metrekab av tê depokirin, lê niha bi tenê 160 milyon metrekab depokirî ye. Li kantonê golek tenê heye, ew jî gola Xatûniyê ye ku 15 milyon metrekab avê depo dike. Dewleta Tirk ji sala 2019'an ve anku piştî Serêkaniyê dagir kir, ava stasyona Elokê li ser zêdetirî milyonek kesên li Hesekê biriye. Her wiha ava çemê Firatê jî kêm kiriye.

Li kantonê 27 hezar û 150 bîr hene ku ji bo çandiniyê wek çavkaniya sereke tên bikaranîn. Di malan de jî 2 hezar û 150 bîr hatine kolandin. Li gel kêmbûna ava çem û bendavan asta ava bîran jî dadikeve.

### Kêmbûna şînahiyê

Li gorî daneyên Desteya Çandinî û Avdanê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîkî, li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê şînahî ji sedî 2-4`ê rûbera giştî ya herêmê ye. Li kantona Cizîrê şînahî ji sedî 0,17 e. Lê 4 milyon darên fêkî û yên din hene.

Di salên aloziyê û kontrolkirina çeteyên DAIŞ`ê de, gelek dar hatin birîn. Heta niha daneyeke fermî nîn e, lê tê texmînkirin ku nîv milyon dar li Çiyayê Kizwanan hatine birîn.

Kantona Cizîrê beşeke Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye ku sêyeka wê zuha ye û li pêşberî pirsgirêka şorbûnê re rû bi rû ye. Salane ji 1-2 hezar hektar axa wê paş dikeve û ji sedî 85`ê erd di bin gefa çolbûyînê de ye. Li gorî Silêman, ev rewş bêaramiyê çêdike û rasterast bandorê li jiyana xelk û ewlehiya xwarinê dike.

Çemê Xabûr yek ji çemên sereke yên herî mezin ên li herêmê ye. Li gorî daneyên Gerînendetiya Çavkaniyên Avî ava wî pir kêm bûye. Kêmbûna ava Xabûrê bandorê li nêzî 16 milyon donimên genim, ceh û darên fêkiyan ên li geliyê Xabûrê di herêma navbera kantona Cizîr û ya Dêrazorê de dike. Li gorî daneyên Gerînendariya Daristan û Parastgehan, hejmara darên wekî tû, hejîr û spîndaran gelekî kêm bûye. Gelek ajal jî wek berazên kovî, dirindeyên nêçîrê, masî, xezal êdî xuya nakin.

### 'Siberoj di xetereyê de divê her kes tiştinan bike'

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê girîngiyeke mezin dide qada jîngehî û çavkaniyên xwezayî. Ji lew ra desteyeke taybet ava kir û sala 2022`yan ji bo hawîrdorê qanûn derxist. Bi rêya wê qanûnê armanc dike jîngehê û çavkaniyên xwezayî biparêze.

Silêman ev yek destnîşan kir û got: "Deste bi hevkariya însiyatîfên civakî, sazî, deste û civakê li gorî siyasetên herêmê û derfetan hewl dide bandorên aloziyên jîngehî kêm bike. Ji lew ra ji bo zêdekirina şênahiyê li gorî bernameyên diyar kar û xebatê dimeşîne."

Li gorî Daneyên Gerînendetiya Daristanan a Desteya Çandiniyê û Avdanê, ji 2014`an ve desteyê milyonek dar û şitil li bajar, bajarokên kantonê belav kirin û xebatên çandina daran hîna berdewam in.

Silêman wiha domand: "Ev proje têrê nakin ji ber wê Desteyê bi rêya Gerînendetiya Şopandina Jîngehî, tedbîr û siyasetên jîngehê û şert ji sazî, kargeh û şîrketên li herêmê re danîn ku divê li gorî wan kar bikin."

Silêman di dawiyê de got: "Ji bo ku ev rewş xirabtir nebe û ji bin kontrolê dernekeve, divê sazî, şîrket, civak û endamên civakê, çavkaniyên xwezayî biparêzin. Ji ber ku çavkaniya sereke ya pêdiviyên rojane ye ne tenê li herêmê lê belê li seranserî cîhanî. Pêwîstiya nifşên bê bi çavkaniyên xwezayî hene. Divê em xerckirina zêde ya van çavkaniyan kêm bikin û rêbazên alternatîf ên dostên jîngehê bi kar bînin."

# Erel: Em li dijî tecrîdê dengê xwe bilind bikin

**Navenda Nûçeyan**

Hevseroka TUHAY-DER'ê ya Amedê Yeter Erel diyar kir ku polîtîkayên tecrîdê civak û girtîgeh xistine bin bandora xwe û got: "Em li dijî tecrîd û zilmê dengê xwe bilind bikin."

Hevseroka Amedê ya TUHAY-DER'ê Yeter Erel ragihand ku tecrîda li Îmraliyê tenê bi kesekî re sînordar nemaye, gelê Kurd xistiye bin bandora xwe.

Hevseroka Amedê ya TUHAY-DER'ê Erel diyar kir ku dewlet bi tecrîdê re dixwaze îradeya siyasî ya gelê Kurd bişikîne û lêgerînên demokrasî û aştiya civakî têk bibe.

Erel destnîşan kir ku ev îzolasyon di heman demê de ji bo muxalefeta demokratîk a li Tirkiyeyê û hêviyên aştiya civakî derbeyeke giran e.

Erel anî ziman ku tecrîd di nava civakê de travmayên kûr diafirîne û got: "Tecrîda li ser Abdullah Ocalan di nava beşeke mezin a gelê Kurd de dibe sedema hêrsê. Ev rewş ne tenê gelê Kurd, her wiha ji aliyê neyînî ve bandorê li beşên civakî yên di lêgerîna edaletê de ne, dike. Bi taybetî, di nava nifşên ciwan de li dijî van polîtîkayên zordar ên dewletê lêgerîna edalet û berxwedanê hîn xurttir dibe."

### Veguherî navenda êşkenceyê

Erel diyar kir ku polîtîkaya tecrîdê ya li Îmraliyê, li girtîgehên Tirkiyeyê hemûyan dibe sedema binpêkirina mafên mirovan û ev tişt got: "Şert û mercên girtîgehê her roja ku derbas dibe, hîn xirabtir dibe. Bi taybetî li ser girtiyên siyasî yên Kurd, zext zêde dibin. Mafên wan ên peywendiyê tê astengkirin û cezayên displînê yên kêfî zêde tên pêkanîn. Rewşa girtiyên nexweş jî pir giran e. Mafê wan ê xizmeta tenduristiyê tê astengkirin. Gelek girtiyên nexweş ên di xeteriya jiyanî de ne terkî mirinê têne kirin. Ji sala 2023'yan ve zêdeyî hezar û 600 girtiyên nexweş li girtîgehan e û ji van 600 di kategoriya nexweşên giran de ne. Ev şert û merc nîşan didin ku girtîgeh veguherîne navendên êşkenceyê."

### Bi biryardarî têkoşîn tê domandin

Erel anî ziman ku îsal weke malbatên girtiyan û komele gelek çalakî û merasîm lidar xistin û wiha pêde çû: "Di çarçoveya van çalakiyan de her hefte em li ber girtîgehan çalakiyên rûniştinê lidar dixin. Di serî de Kurdistan, li her çar aliyên Tirkiyeyê bi rengekî hemwext ev çalakî tên lidarxistin. Ev çalakiyên me yên 'Deng bide azadiyê' ji bo rabûna tecrîda li ser Abdullah Ocalan û hemû girtiyên siyasî, ji bo bidawîbûna şert û mercên dermirovî yên li girtîgehan dengekî xurt û banga piştevaniyê ye. Rewşa girtiyên nexweş jî weke meseleyeke lezgîn li pêşberî me disekine. Em ê jî çalakiyên xwe bidomînin. Ji bo agahdarkirina raya giştî û di platformên neteweyî û navneteweyî de vê pirsgirêkê bixin rojevê, em têkoşîna xwe bi biryardarî bidomînin. Di vê pêvajoyê de alîkarî û piştevaniya gelê me, wê bibe ewlekariya herî girîng a vê têkoşîna edaletê."

### Zilmeke ku bandorê li me hemûyan dike

Erel xwest ku xwedî li têkoşîna edalet, aştî û mafên mirovan bê derketin û ev tişt got: "Polîtîkayên tecrîdê amûreke zilmê ye ku ne tenê kesekî yan jî civakekê,



bandorê li me hemûyan dike. Divê em li dijî vê zilmê bisekinin û rûmeta mirovahiyê biparêzin. Em ji bo aştî, edalet û azadiyê bibin yek û dengê xwe bilind bikin. Em ji bîr nekin ku; bêdengmayîn, tê wateya hevkariya zilmê. Ji bo ku her kes bibe parçeyekî vê têkoşînê û edalet pêk were, çi ji destê kê tê divê bike. Eger em bi hev re tevger bigerin, em ê rêya ku diçe azadî û aştiyê bikarin vebikin. Ez bang li gelê me û raya giştî ya navneteweyî hemûyan dikim; em li dijî tecrîd û zilmê bi hev re têbikoşin û ji bo edalet û aştiyê dengê xwe bilind bikin."



# Dîroka PDK'ê ya dagirtî bi xiyanetê... (Rojhilatê Kurdistanê)

PDK'ê ji dîroka avabûna xwe ve û heta niha xeta xiyanetê berdewam dike, çi hêzeke şoreşgerî li Kurdistanê derkeve PDK'ê şerê wê dike û hewil dide wê tesfiye bike. Li Rojhilatê Kurdistanê jî çekdarên PDK'ê bi fermana Mela Mistefa Barzanî ji bo razîkirina şahê Îranê bi 10'an şoreşger û pêşengên Rojhilatê Kurdistanê qetil kirine.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Dema ku mirov rûpelên dîrokê vedike, li ser axa Kurdistanê, du xet an jî ferasetên cuda pêl bi pêl diçe pêş. Xetek neteweyî û welatparêziyê ku ji bo azadî û doza rewa ya gelê Kurd di nava têkoşînê de ye û ji bo berdêlên giran dane, li beramberî wê jî xeta xiyanetê û destên dijmin û dagirkeran in ku timî li gel dijmin cih digire, pişt daye gelê xwe û li dijî xeta neteweyî di çeperan de ye.

Di dîrokê de timî Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) li har çar parçeyên Kurdistanê di nava xiyanetê de ye û ti hêzek azadîxwaz û şoreşger a Kurd nemaye ku li dijî şer nekirîbe. Di heman demê de ti rejîm û dewletek dagirker, dijminekî Kurd jî nemaye ku li gel hevpeyman nekirîbe.

Şahê Îranê ji bo bikaranîna PDK'ê, bi her awayî alîkariya madî û leşkerî li dijî Iraqê di tevgera Îlonê de pêşkêşî Mele Mistefa Barzanî kir. Endamê Îstixbaretê Îsa Pejman peywendîkarê di navbera Mele Mistefa Barzanî û Şahê Îranê bû. Lê piştî îmzekirina peymana Cezayîrê ya 6'ê Adara sala 1975'an û peymana Şahê Îranê Mihemed Raza Behlewî ya li gel Sedam Hisên ku wê demê cîgirê Serokkomarê Iraqê bû, şahê Îranê, dest ji Mela Mistefa diberde û alîkariya jêre dirawestîne. Mistefa Barzanî piştî 14 rojan 'Aşbetaliyê' dike û dawî li tevgara Îlonê tîne.

Li gorî gotina biraziyê Mela Mistefa Barzanî, Eyûb Barzanî û Siyasetmedarê Kurd Dr. Mehmûd Osman ku bi xwe şahidek bû, piştî peymana Cezayîrê, wê demê Mela Mistefa di civînekê de ji Şahê Îranê re gotiye; "Em miletê tene, madem qezenca Iraqê di vê peymanê de heye ku dayika me ye jî, me tiştek li ser nîne. Em li jêr fermana tedene û bêje bimirin, dimirin."

Her wiha di pirtûka 'Xiyanetekanî Qiyade Miweqete, bi neteweya Kurd' ku ji aliyê Abdullah Hesen û Dr. Qasimlo nivîsîne, wiha qala wê qonaxê dikin: "Serokatiya Barzanî li şûna alîkariya xelkê Kurdistanê bike, li vir alîkariya dewleta kevneperest û nokerê emperyalîza Mihemed Reza Şah dikir. Berê xwe da dijminê Kurd û pişta xwe da komelên xelkê Kurdistanê. Di rastiyê de berê bingehîn ê



aşbetaliyê di sala 1975'an de Barzanî di vir de daniye."

Têkildarî peywendiyên PDK û Şahê Îranê de, şertê herî bingehîn ê alîkariya rejîma Mihemed Reza Şah ya ji bo Barzanî û tevgera wî ewe ku rê nede ti tevger û rêxistin li dijî rejîma Şahê Îranê serî rake û derkeve.

Her wiha li gorî agahiyên vê pirtûkê, piştî vê lihevkirinê, çekdarên PDK'ê bi fermana Şahê Îranê êrişî baregehên Hizba Demokratîk ên li sînor kir û dorpêç kirin. Li Rojhilatê Kurdistanê mil bi milê leşker û cehşên rejîmê ketin li pey pêşmergeyên Hizba Demokrata Kurdistana Îranê, her wiha bi fermana Mela Mistefa Barzanî xelekên qetilkirina li dijî rêveber û şoreşgerên diyar ên Rojhilatê Kurdistanê destpê kir.

Li gorî pirtûka 'Xiyanetekanî Qiyade Miweqete, bi neteweya Kurd' qetilkirina herî berçav a ji aliyê çekdarên PDK'ê ve, ya bi fermana Mele Mistefa Barzanî li dijî pêşengên şoreşa Rojhilatê Kurdistanê hatî kirin, ji bo razîkirina şahê Îranê bûn.

Di sala 1967'an de Birayme Surî Mihemed Delaweyî yê xelkê herêma Xanê yê ji gundê Alan li gel hejmarek pêşmergeyên Hizba Demokrat hatin şehîdkirin û cenazeyên wan dan îstixbareta rejîma Îranê.

Di dawiya heman salê de, Mela Rehîmê Wertî, nasnas Mîrza Ehmed ê endamê Komîteya Navendî ya Hizba Demokrata Kurdistana Îranê, ji aliyê Mele Mistefa Barzanî ve tê girtin û dixwaze bi zindî radest bike, ew jî nerazîbûnek zêde nîşan dide û her li wir bi zindî gulebaran dikin.

Di dawiya heman mehê de, Siware Sekirî, Eskender Elî, Mihemed Muimînî, Hebîb Ebûbeir, Cefer Ebubkir, Munteqimî Qazî û li gel dehan pêşmergeyên din piştî girtinê dan Îranê.

Di meha Adara 1968'an de herdu rêveberên şoreşger Silêman Muinî û Xelîl Şewbaş li nêzî bajarê Silêmaniyê bi fermana Mele Mistefa Barzanî ji aliyê çekdarên PDK'ê ve hatin şehîd kirin û cenazeyên wan dan Îranê.



Dilşan Resul û Mela Aware ku du pêşengên şoreşa Rojhilatê Kurdistanê bûn bi fermana Mela Mistefa Barzanî hatin şehîd kirin û cezaneyên wan dan rejîma Îranê. Salih Lacanî û 7 pêşmergeyên din ku piştî şehîdkirina Mela Awara hatibûn li gel Mela Mistefa, ewane jî hatin girtin û radestî Îranê kirin, piştre hatin gulebarankirin.

Di sala 1979'an de piştî rûxîna Şah Pehlewî û hatina ser text a Komariyan ya bi rêveberiya Xumeynî, neviyên Mela Mistefa Barzanî ku wê demê ji Qiyade Miweqeteyan pêk dihat, li dijî Şah piştgiriya hatina ser text a Xumeynî dikin. Mesûd Barzanî di heman salê de diçe Parisê û hevdîtinekê li gel Xumeynî dike. Di hevdîtinê de soza piştgirî û hevkariya PDK'ê ya ji bo rejîma wî ya li dijî Tevgera Rizgarîxwaz a Kurdên Rojhilatê Kurdistanê dubare dike.

Fazil Mîranî wê demê li gel medya Îranê hevpeyvînekê dike ku ji aliyê 'Bi Tawan' a Farisî ve hatiye parvekirin, li ser peywendiyên PDK û rejîma Xumeynî dibêje, "Em beşekin ji Îranê û nahêlin, ti derbek li desthilata wê bikeve. Em nikarin vê firset û xizmeta rejîma Îranê ji bîr bikin û rê jî nadin ti derbek li şoreşa Îmam Xumeynî bikeve."

Li gorî parçe dîmenek arşîfa Supay Pasdarên ku hevpeyvînekê li gel fermandarekî pêşmergeyên Qiyade Miweqete (Rêveberiya demkî) yên PDK'ê çêdike, tekeziyê li hevpeymaniya PDK û rejîma Îranê ya ji bo çewisandina Tevgera Rizgariya Kurdên Rojhilatê Kurdistanê ya di navbera 1981 û 1982'yan de dike. Weke di dîmen de xuya dike, çekdarên PDK'ê mil bi milê pasdar û cehşên Îranê tevlî êrişên li dijî şoreşgerên Kurd dibin û Kurdan bi dijmin û çete pênase dikin. Her wiha Fermandarê Qiyade Miweqete hîtabî Pêşengê Şoreşa Kurd Dr. Qasimlo dike û dibêje, "Eger şerê evan bikî, şerê me jî dikî." Armanca wî rejîma Îranê ye.

Di pirtûka 'Xiyanetekanî Qiyade Miweqete, bi neteweya Kurd' wiha tê gotin: "Çekdarên Qiyade Miweqete her dema xwe lewaz didîtin dikevin lawakirinê ku bêyî destûra Hizba Demokrat tevger nakin. Lê, di sala 1979'an de dema ku rejîma Xumeynî banga cîhadê li dijî xelkê Kurdistana Îranê kir û rêveberiya Qiyadeya Miweqete û çekdarên derdora Barzanî wiha fam kirin ku Hizba Demokrat lewaz bûye, demildest li herêma Merîwan mil bi milê pasdarên Îranê li dijî pêşmergeyên hizma me çûn."

Di vê pirtûkê de, qala gulebarana pêşmergeyên miweqete ya di dema xwepêşandanê de tê kirin û wiha tê gotin: "Li Şino gule li xwepêşandana xelkê kir û 6 kes kirin qurbanî. Li herêma Urmiyê, bi piştgiriya Îdris Barzanî nêzî hezar mal koçber kirin. Her li ser pêşniyara Îdrîs derdorî sed kesî ji vê herêmê bûn cehşên fermî yên rejîma Xumeynî."

Her wiha di wê serdemê de Sekreterê Hizba Demokratîk Mistefa Hicrî di hevpeyvîneke taybet li gel ajansa Emerîka AP'ê (Associated Press) dike û têkildarî kurên Mela Mistefa û PDK'ê de dibêje: "Derdora Barzanî bi rêveberiya Îdrîs Barzanî û Mesûd bûne dardestê rejîma Xumeynî. Li hemû şerên li dijî azadîxwazên Îranê li Kurdistanê tevlî dibin."

Li vir derdikeve holê ku PDK'ê ji bo mayîna xwe ji berî aşbetaliyê û piştî aşbetaliyê, fermanên îstixbareta Îranê (Sawak) bû û di qetilkirina pêşmergeyên Hizba Demokrat a Îranê de ku li ser daxwawza Sawak'ê bû destê xwe neparastiye. Dema ku rejîma şah dirûxe, peywendiyên wê li gel Xumenyî çêdibin û ji bo qayimkirina desthilata Xumeynî xwîna dehan pêşmerge û welatiyên Rojhilatê Kurdistanê dirijîne. Di wê rewşê de dixwaze sûd ji rûxîna rejîma şah bigire û ji bo xwe hinek derfet bi dest bixe.

# Rizgarkirina Minbic ji tariyê ber bi ronahiyê ve

**Bajarê Minbicê di sala 2014`an de ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hatibû dagirkirin. Pêngava rizgarkirina bajarê Minbicê jî bi coş, kelecan û şewitandina çerşefên reş ji milê gelê Minbicê ve hate pêşwazî kirin. Bi saya berxwedana gelê Minbicê piştî rojên koletiyê û tariyê ronahî ji nûve pişkivî.**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Bajarê Minbicê, yek ji bajarên herî kevnar e û xwedî cihekî stratejîk e. Gelek netewe, reng û çandên gelan di vî bajarî de dijiyan. Çeteyên DAIŞ'ê, bi dagirkirina bajarên weke Reqa, Tebqa, Dêrazor, Şedadê, Şengalê, Mûsil û hwd. bajarê Minbicê jî dagir kirin. Çeteyên DAIŞ'ê piştî ku bajar dagirkirin, dest bi kuştin, talan, revandina mirovan, xirakirina cihên dîrokî, kuştin û revandina jinan kirin. Piştî ku şervanên QSD`ê di Kobanê de berxwedaneke dîrokî li hemberî çeteyan raber kirin, bi xwîna hezarê şehîdan Kobanê rizgar kirin. Di sala 2016`an de gelê Minbicê daxwaz ji hêzên QSD'ê kir ku bajarê wan ji çeteyên DAIŞ'ê were rizgarkirin.

### Dîroka avabûna bajarê Minbicê

Berê navê paytexta Firatê ya Sûriyê li Minbicê dihat kirin. Minbic, ji kevintirîn bajarên Rojhilata Navîn û cîhanê ye ku tê texmînkirin di B.Z. sedsala 12`emîn de ji aliyê bawermendên Atargatîs bajar hatiye avakirin. Li gorî hinek belgeyan, dîroka bajar heta 5 hezar salan diçe. Di vî bajarê kevnar de, gelek hêzên wekî Rom, Sasanî, Memluk, Makedon, Abasî, Fatimî, Eyûbî, Mogol, Osmanî û Fransiyan serwer bûne. Her hêza ku serwerî kiriye, navê bajêr jî li gor xwe guhertine. Herî dawî jî Minbic ku bi zimanê Suryanî tê wateya kaniya diherike. Her wiha di sedsala sêyemîn de paytexta herêma Firatê bû û ji mezintirîn bajarên Sûriyê ye.

### Stratejiya Cografî ya Minbicê

Minbic yek ji bajarên aborî yên Sûriyê ye. Bajarê Minbicê ku li ser rêya M4`e, bajarên weke Efrîn, Şehba, Haleb, Raqa, Kobanê, Tebqa, Cerablûs û Babê bi hev girê dide. 25 km dikeve Rojavayê çemê Firatê, 75 km dûrî bajarê Helebê ye, 40 km li Başûrê Cerablûsê ye, 65 km li Rojhilatê Kobanê, 45 km jî li Rojavayê Babê û 40 km jî dûrî sînorê Tirkiyê ye. Ji aliyê Bakur ve nêzî çemê Sacûr, ji aliyê Başûr ve jî nêzî çemê Ebû Qelqel e ku ev her du çem li çemê Firatê bi dawî dibin. Rûpîvana Minbicê û gundewarê derdorê hezar û 295 km çargoşe ye. Berê ji aliyê îdarî ve, Minbic girêdayî parêzgeha Helebê bû û navenda wê bajarê Minbicê bû. 554 gund girêdayî bajar in ku bajar ji navçeyên Xebsa, Meskenê, Ebû Qelqel û Ebû Kehf pêk tê.

Bi awayekî sereke, niştecihên Minbicê û gundewarê wê, debara xwe bi çandina genim, sebze û daran dikin. Hinek ji wan jî di karên bazirganiyê de kar dikin. Du deriyên bazirganiyê bi navê Um Cilûd (Hîmran) û On Dadat ku di navbera Minbic û Cerablûsê de ne hene. Ev derî, li gor xwestekên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê tê vekirin û girtin.

### Minbic ji bo çeteyan xwedî girîngiyek stratejîk bû

Çeteyan ji bo ku Minbic neyê rizgarkirin hemû hewildanên xwe kirin. Gel wekî mertal bikaranîn, her cih kiribûn teqemenî. Ji ber Minbic ji bo çeteyan xwedî girîngiyek stratejîk bû. Ji sedî 95 çeteyên ku şer dikirin biyanî bûn û mejiyê şer ê DAIŞ`ê bûn. Piştî rizgarkirina Girê Spî, hemû têkiliyên DAIŞ û dewleta Tirk li ser Minbicê re berdewam dikir. Pêdiviyên DAIŞ`ê ji Cerablûsê dihat Minbicê û ji vir diçû Heleb, Reqa û heta Mûsilê. Çeteyên biyanî yên di rêya Tirkiyê re dihatin, piranî li Minbicê bi cih dibûn û rîya bêhinstendina DAIŞ ya ku xwe bigihîne Tirkiye û Ewropa Minbic bû. Lewma weke biryargeha leşkerî ya Bakurê Helebê ya DAIŞ'ê rol dilîst ku çeteyan navê "Cenet El Muhacirîn" bi Kurdî "Bihuşta Muhaciran" lê kiribûn.

Minbic wekî ku ji çeteyan re cihekî stratejîk û girîng bû heman demê de ji bo Şoreşa 19`ê Tîrmehê û herêmê bi giştî jî xwedî girîngiyek mezin bû. Bi rizgarkirina bajar re rêya di navbera kantonên Kobanê û Efrînê jî wê bihata vekirin û dorpêça li ser Efrînê bihata şikandin.

### Minbic bû armanca gelek desthilatdaran

Bajarê Minbicê ji ber girîngiya xwe di dîroka de, bû armanca gelek hêz û împeratoriyan. Di dirêjahiya dîrokê de, çend caran di wêraneke tam an jî beşî de derbas bûye. Ne tenê beriya zayînê û piştî zayînê rewşa bajarê Minbicê ji aliyê desthilatdaran ve dihat dagirkirin. Ev bajarê ku her rastî pişaftin, êriş, desthiladariyê hatiye. Di serdema Osmanî û rejîma Baas de jî hikûm li ser gel hatiye ferzkirin ku hewldana guhertina demografiya herêmê pêk anîne.

### Polîtîkaya pişaftinê

Li bajarê Minbicê gelek eşîrên ereb û kurdan hene. Li Minbicê gelê Kurd gelê herî kevn û resen e. Eşîra kurdan a herî kevn li Minbicê, Mala Betran û Mala Mistefa Memo ne. Zêdetirî 30 eşîrên ereban hene û gelek şaxê wan hene. Bi destpêkirina sala 2000`î re, rejîma Baasê hewl da eşîrên bajêr parçe bike, ev yek bi rêya derxistina nakokiyan di navbera wan de pêk hat. Beriya şerê navxweyî yê Sûriyeyê nifûsa Minbicê 90 hezar bû. Beriya Kembera Ereban jî zêdetir Çerkes lê dijiyan. Lê di encama polîtîkayên pişaftin û veguherandina demografiyê de, weke hemû bajarên kurdan, Minbic jî wergerandine bajarê ereban. Di sala 2011'an de beriya şer dest pê bike nifûsa vî bajarî ji sedî 68 Ereb, ji sedî 25 Kurd, ji sedî 5 Tirkmen, ji sedî 2 jî Çerkes bû.

### Bajarê xwedawendan ket dest dijminê mirovahiyê

Di sala 2011`an de gelên Rojhilata Navîn li hember desthilatdaran serî hilda û gelek dîktator li pey hev hatin xistin. Çirûska ku li Tunisê vêket, li Cezayir, Misir, Lîbya, Yemen û Bahreynê belav bû. Û 15`ê Adara 2011'an de ev çirûsk gihiştibû Sûriyê. Komên opozîsyonê yên ku piştre teslîmî dewleta Tirk bûn, di 20`ê Tîrmeha 2012`an de bi navê tabûrên Artêşa Azad bajarê Minbicê ji rejîma Baasê girtin. Piştre DAIŞ êrişî Minbicê kir û di 21`ê Çileya 2014`an de bajar dagir kir. Êdî bajarê xwedawendan ket dest dijminên mirovahiyê û bi taybet dijminê jinan.

### Bi tevlîbûna 12 hezar şervanan pêngava Minbicê dest pê kir

Zedetirî 2 sal û nîvan bajarê Minbic ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê hatibû dagirkirin û di van salên dagirkeriyê de, hemû cûreyên îşkence, zilm, tecawûz, lêdan, kuştin, revandin, firotin û serjêkirin li ser gelê Minbicê hat meşandin. Êdî gelê di nav lepên van hovên serdemê bang li Meclisa Leşkerî ya Minbicê kirin ku werin bi hawara wan ve. Û zarokên şoreşê vê bangê bêbersiv nehiştin. Piştî serkeftina Kobanê Hêzên QSD`ê û Meclisa Leşkerî ya Minbicê dest bi amadekariyên rizgarkirina bajarê Minbicê kiribûn, lê bi awayekî veşartî dihat meşandin. Di 1`ê Hezîranê de Meclisa Leşkerî ya Minbicê li Bendava Tişrînê daxuyaniya pêngava rizgarkirina gundewar û bajarê Minbicê ragihandibû. Piştî daxuyaniyê bi tevlîbûna 12 hezar şervanan pêngav destpê kir.

### Pêngava Şehîd Feysel Ebû Leyla

Roja 2`ê Nîsana 2016`an yekemîn gava berbiçav hat avêtin ku destpêkê gundê Mistefa Hemdan (Mehşiyêt Şêx Ubêd) hat rizgarkirin. Şems El Şemal, Suwar Minbic (Şorşegerên Minbic), Îtifaqa Tûgayên Firat, Cindul Heremeyîn, Taburên Şehîdên Firat, Tabura El-Qewsî û Ketibetul Tirkman El-Minbic (tabura Tirkmanên Minbicê) li ser bendava Tişrînê daxuyaniyek dan û di bin navê "Meclisa Leşkerî ya Minbicê" de hêza xwe kirin yek. Fermandarê Taburên Şems El Şimal, Feysel Ebû Leyla roja 3`ê Hezîranê li eniya Tişrîn di encama teqîna guleyek hawanê di serê xwe de bi giranî birîndar bibû û 5`ê Hezîranê şehîd bû. Bi şehadeta Ebû Leyla re navê pêngavê vegeriya "Pêngava Şehîd Fermandar Feysel Ebû Leyla". Hemû şervanan ji bo pêkanîna xeyalên Ebû Leyla û tolhildanê bi beşdarbûna 43 nûnerên eşîr û kesayetên ji herêma Minbicê civînek li dar xistin. Di encama civîna 3 saetan de "Meclisa Sivîl a Minbicê" hat damezrandin.



### Piştî 73 rojan jiyan zindî bû

Piştî berxwedana şervanan di roja 73`yan de operasyona rizgarkirina Minbicê mizgîniya ku herkes li bendê bû, hat. Keda nemirên şoreşê 12`ê Tebaxa 2016`an de bi temamî ji çeteyan hat paqijkirin. Mizgîniya rizgarkirinê ji raya giştî re ji ber paqijkirina teqemeniyan 2 rojan dereng ma ku di 15`ê Tebaxa 2016`an de bi rêya daxuyaniya rizgarkirina Minbic û deskeftiyekî din yên pakrewanan ji cîhanê re hate ragihandin.

### Bîlançoya rizgarkirinê

Di operasyonê de nêzîkî 300 gund û bajarok hatin rizgarkirin. 4 hezar û 180 çete hatin kuştin. 112 çete bi saxî dîl hatin girtin. Her wiha di tevahiya operasyonê de 264 şervanên Kurd, Ereb û enternasyonal şehîd bûn. Di heman demê de ji destpêka operasyonê heta dawî zêdetirî 170 hezar sivîl hatin rizgarkirin. Piştî ku çeperên parastinê hatin xurtkirin roja 23 Tebaxa 2016`an yekîneyên YPG û YPJ'ê ji Minbicê vekişiyan. Êdî Meclisa Sivîl û gelê Minbicê bi hev re dest bi avakirina jiyana nû kirin.

### Gelê Minbicê sererastkirina wêraniya DAIŞ`ê kirin

Bi mizgîniya rizgarkirinê re êdî gelên bajar dest xwebirêxistinkirin û sererastkirina wêraniya DAIŞ`ê kirin. Gelên Minbicê di serî de Meclisa Sivî, meclisên gel ên gund û taxan, komîn, akademiyên perwerdeyê, rêxistina ciwanan, Mala Jin, Şaredarî, saziyên xizmetguzariyê û dadgeha gel ava kirin. Piştî rizgarkirinê, bajar ji gelek koçberan re jî bû wargeh. Bajar gelek koçberên ku ji herêmên di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê de û her wiha herêmên di bin serweriya hikumeta Şamê de jî himbêz dike. 2 kampên koçberan bi navê Kampa Rojhilat a Nû û Kampa Rojhilat a Kevin li gundê Rêsm El Ehmar yê girêdayî bajarê Minbicê hene. Ev kamp di sala 2017`an de hatine avakirin.

### Piştî rêzgarkirina DAIŞ`ê êdî dewleta Tirk dixwaze dagir bike

Ji rizgarkirinê heya niha ve dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê ji barergehên leşkerên dewleta Tirk êrişan pêk tîne û êrişên wê berdewamin. Tevî ku ev sûcên berçavê cîhanê tên kirin dewleta Tirk bêtirs, vekirî dîsa gefên dagirkirina herêma Minbicê dixwe. Çeteyên DAIŞ`ê ji sala 2014`an heyanî nîvê sala 2016`an ve bi hejmarên mezin xwe li ser sînorê di navbera Minbic û Tirkiyê de bi cih dikirin û giştî Minbic di bin kontrola DAIŞ`ê de bû. Di wê demê de tu helwesta tirkan derbarê Minbicê de çênebû. Lê piştî rizgarkirina Minbicê wekî "xeterî" li ser xwe dibîne. Ev tenê cihê pêkenokê ye ku ew çeteyên cîhanê kiribû nav metirsiyeke mezin, dewleta Tirk re tu xeterî ava nekir, lê niha hebûna xweseriyê xeterî jê re ava dike. Lê gel di wê baweriyê de ye ku çawa DAIŞ li Minbicê hat şikandin wê dewleta Tirk jî tu carî biser nekeve.

### Piştî rizgarkirina bajarê Minbic, jin

Di 15'ê Tebaxa 2016'an de Minbic ji çeteyên DAIŞ'ê hat rizgarkirin. Beriya heft salan bi serkeftina roja 15'ê Tebaxê re li bajarê Minbicê rewşa jinan guherî û di civakê de bûn xwedî rol, xwe nas kirin, hêviya jiyana hevpar ava kirin.



# 'Pêngava15'ê Tebaxê dara zuha bibû ji nû ve şîn kir'

**Şahidê kêliyên dîrokî yê 15'ê Tebaxê Ebdulkerîm Mijinî diyar kir ku beriya 15'ê Tebaxê li Kurdistanê dara azadiyê zuha bibû, lê piştî wê erdhejeke mezin di mejiyê dagirkeran de pêk hat û dara ku zuha bibû ji nû ve şîn bû.**

**Navenda Nûçeyan**

Pêngava 15 Tebaxa 1984'an ku bi giştî wekî destpêka şerê rizgariya Kurdistanê tê naskirin, 40 sal li pey xwe hişt. Di bin Fermandariya Egîd û Eliyê Berbiçavk ji 2 milan ve êriş li ser baregehên dijmin hatine kirin. Dewleta Tirk ya dagirker li hemberî wan çalakiyên şoreşgerên Kurdistanê matmayî ma û erşê desthilatdariya wê hat hejandin.

Derbarê pengava 15 Tebaxê roja vejîna gelê kurd, weltparêzê kurd ku bû şahidê wan kêliyên dîrokî Ebdulkerîm Mijinî ji rojnameya me re axivî.



### Derketina Rêber Apo û Pêngava 15'ê Tebaxê Vejîn e

Ebdulkerîm Mijinî da xuyakirin ku pengava 15'ê Tebaxê gelê razayî ji xewa giran ya bindestiyê şiyar kir û wiha got: "Gelê Kurd li Rojhilata Navîn, gelê herî kevnar e. Pir caran serhildanên gelê Kurd li her çar beşên Kurdistanê çêbûn, lê ji ber armanc ne armancek birdozî û polîtîk bû, ew serhildan dihatin têkbirin. Sedema bingehîn jî qelsbûyîna pêşengiyê bû. Gelê Kurd di dîroka xwe ya hezarê salan de ji zordarî û zextê xilas nebûye. Hertim bi tunebûnê û qirkirinê re rû bû rû mane. Lê piştî derketina Rêber Apo her tişt hat guhertin. Ji ber ku ew xwedî raman û bîrdoziya rizgariya gelê kurd e. Derketina Rêber Apo li hemberî dagirkeran û Dehaqên wê demê, wekî derketina Kawayê Hemdem bû. Rêber Apo, gelê Kurd beriya Tevgera Azadîyê derbikeve holê wek 'Darê zuha' pênase kir. Derketina Rêber Apo avakirina Tevgera Azadîyê bû. Pêngava 15'ê Tebaxê jî dengekî nû da cîhanê. Ne tenê ji bona gelê Kurd, ji bona gelê bindest yê cihanê bû fîşeka xêlasbûyin û rizgarkirina ji koletiyê."

### Fîşeka yekemîn ku tenê li Dihê û Şemzînanê teqiya, deng da hemû cîhanê

Ebdulkerîm Mijinî da xuyakirin ku Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ji bona gelê Kurdistanê derfeteke mezin û bêhempa bû û wiha domand: "Pêngava 15'ê Tebaxê û destpikirina şerê çekdarî, kurdên ji 7 salî heya 70'ê salî ji xew şiyar kir û kelecaneke mezin avakir, 15'ê Tebaxê jiyanek nû bû. Berê jî gelê Kurd yê Botan, Behdînan di çiyayan de jiyan dikir û çekdarîbûn hebû, lê li benda pêşengekî û birdoziyekê bûn. Bandora PDK'ê li herêmê hebû. Lê ew ne tevgerek birdozî û xwedî felsefe bû. Bi teqandina fîşeka yekemîn di bin fermandariya Fermandarê mezin Egîd (Mahsûm Korkmaz) de li derdorê Tevgera Azadiyê kombûyîn ava bû. Pir tevger û serhildanên kurd yên beriya Tevgera Azadiyê de encam hat derxistin. Li ser wê bingehê di dîroka 15'ê Tebaxa 1984'an de di Bakurê Kurdistanê bajarê Sêrtê ya navçeya Dihê û Colemergê navçeya Şemzînanê hemdemî çalakî li ser qereqolên dewleta Tirk ya dagirker hat kirin. Çalakiya Dihê bin fermandarîya Egîd (Mahsûm Korkmaz), Şemzînan jî bin fermandariya Elî Berbiçavk (Abdullah Ekincî) de hat rêvebirin. Ev heman demê de rê ji bona damezirandina HRK (Hêzên Rizgariya Kurdistan) vekir."


### '15'ê Tebaxê ji bona gelê Kurd dihat wateya yêkiti yê'

Ebdulkerîm Mijinî wisa berdewam kir: "15'ê Tebaxê gelê kurd gihande lûtkeya serkeftinê. Êdî ti kes nikare bêje em ê Kurdan xilas bikin. Ev nêzî 3 salin Herêmên Parastina Medya şerekî pir dijwar diqewime. Ev ne tenê artêşa Tirk ya dagirker e, NATO bi giştî li hemberî şervanên Tevgera Azadiyê şer dike. Ev rihê 15'ê Tebaxê Fermandar Egîdan e. Ger ku xiyaneta PDK'ê nebe, wê artêşa Tirk demildest têk çûba. Ev encama xebatên Rêber Apo û ramanên wî pêk hatin. Beriya 15'ê Tebaxê jî tevgera PDK'ê hebû, lê ji bona berjewendiyê gel ti kar nedikir, tenê eşîr û malbata xwe bingeh digirt. Niha jî di rêzê pêşî de cih digire û ji dagirkeran re rê vedike. Ev nikarin yêkitiyekê netewî di nav kurdan de bidin avakirin. Tenê malbat eşîra Berzanî difikirin. 15'ê Tebaxê ne tenê ji bona gelê Kurd, ji bona gelên Rojhilata Navîn de jiyan dikin bû hêviyeke mezin. Ji bona aloziyên Rojhilata Navîn tenê çareseriyek heye, ev jî Tevgera Azadiyê ye. Rêber Apo û şehîdên şoreşa Kurdistanê hêviya wan ji me hemûyan yêkitiyê me daxwaz dikin. Pêwiste em daxwaza wan pêk bînin û salvegera vejînê de xebatê xwe zede bikin. Pêwîste em rêxistina xwe pêş bixin. Em civakê perwerde bikin. Hêzên xwe yên leşkerî û çekdarî xurt bikin, tevlîbûnan li ser wê bingehê ava bikin. Ji bona em bikarin deskeftiyên xwe yên her 4 beşên Kurdistanê jî biparêzin."

### 'Tevgera Azadiyê, tevgereke zanistî ye'

Ebdulkerîm Mijinî bi boneya 15'ê Tebaxê di serî de Fermandar Egîd û hemû şehîdên şorêşê bibîranî û axivtina xwe wisa qedand: "Derketina 15'ê Tebaxê ji bona gelên bindest dihat wateya ji nûve dayik bûnê. Bangawaziya min ji bona gelê Başûrê Kurdistanê û Pêşmergeyên welat parêze bila nebin hevkarê xiyaneta PDK û mala Barzanî. Em derdorê pêngava 15'ê Tebaxê bibin xelekek agir. Em rê nedin dagirkeriyê bi hestên me yên welatparêzî bê pêş xistin."

## Israra di plana Dêrazor û Kaosê de



**Zekî Bedran**

Dîsa ji herêma di bin kontrola rêveberiya Sûriyeyê de li dijî Dêrazorê êrîş pêk hatin. Berê jî li vê herêmê êrîş pêk hatibûn û gelek kesan jiyana xwe ji dest dabûn. Armancên wan veqetandina herêmê ji Rêveberiya Xweser, çêkirina nakokiya Ereb-Kurd û desteserkirina herêmên petrolê ye. Ger Dêrazorê were xistin, plan û hewldan hene ku herêmên din ên niştecihên Ereban li pey bên xistin hene. Di esas de beriya her tiştî planên derxistina gelê Ereb ji herêmên xweser da ku gelê Kurd bi tenê bimîne û were pelçiqandin di meriyetê de ne. Rêvebiriya Şamê ji rêderxistina rojevê û bi kar anîna neteweperestiya Ereb, dixwaze bi vê yekê ku gel ji bîr bike çi aniye serê wan, ji nû ve desthilatdariya xwe ava bike.

Pirsgirêk aliyên din jî hene ku ji rêveberiya Şamê wêdetir in. Kes li êş, xizanî û xisarên gel nafikire. Hemû hêz hewl didin qadên hêz û bandora xwe xurt bikin. Îran jî yek ji van hêzan e. Tê zanîn ku Sûriye bûye çi. Îran piştgirî da Beşar Esad ku li ser desthilatê bimîne. Her wiha Rûsya jî piştgirî da Şamê ku li herêmê bimîne. Esad ancex bi vê piştgirîyê dikaribû bijî. Kurdan bi Esad re jî şer nekir. Tevî hemû ferzkirinên Tirkiyeyê jî gelê Kurd li dijî DAIŞ'ê şer kir û tevlî tifaqa wan nebû. Ji ber vê yekê jî Tirkiye Kurdan kir hedef û wek dijmin û terorîst îlan kir. Heger Kurdan ferzkirinên Tirkiyê qebûl bikira û tevlî tifaqa wan bibûna, şensê Beşar Esad nedima ku li ser linga bimîne. Di vî warî de Esad, deyndarê Kurda ye ku li ser linga maye.

Rastî her tim tên veşartin û hewl tê dayin ku wan berovajî bikin. Tirkiye hewl dide wan û gelê herêmê li dijî QSD'ê tehrîk bike, da ku Şamê bigire aliyê xwe. Şerekî psîkolojîk ê bêhempa dimeşînin. Propagandaya dikin dibêjin ku eşîrên Ereb li dijî QSD'ê serî hildaye. Derdorên fermî yên Tirkiyê bang dikin ku petrola herêmê ji gelê Sûriyê re were dewrkirin û ji destê terorîstan bê derxistin. Zextê li hêzên DYA û koalîsyonê dike. Ji bo ku têkiliyên wan bi QSD'ê re qut bike, bazariyên ne maqûl dike. Li ku derê însiyatîfek li dijî QSD'ê an jî li dijî Kurdan hebe, dewleta Tirk xwe bi ser serkî diavêjiyê. Hemû xerabiyan difikire û bi rêxistin dike.

Her wiha Îran tenê bi alîkariya rêveberiya Sûriyeyê sînordar namîne, bi baweriya gelê herêmê jî dilîze. Ji bo pêşxistina Şiîtiyê di nava gel de xebateke giran dimeşîne. Sûriye ne di wê rewşê de ye ku li dijî vê yekê raweste. Her wiha pirsgirêk û nakokiyên Îranê yên bi DYA'yê re tên zanîn. DYA jî li herêmê ye. Îran, li dîjî Amerîkayê bi rêxistinkirin û seferberkirina gel ve mijûl e. Bi rêveberiya Şamê re QSD'ê weke hevkarê DYA'yê nîşan didin. Dixwazin QSD'ê jî têxin nava nakokiyên navbera xwe û DYA'yê. QSD naxwaze bibe amûrê pevçûnan. Tevî vê yekê jî Îran milîsên xwe yên ku birêxistin kiriye, li dijî Dêrazorê dide êrîşkirin û bi çekên giran piştgiriya wan dike. Îran bi fermî nabêje ku ew di van êrîşan de cih girtiye. Lê her kes li herêmê dizane ku yên êrîşan bi rêve dibin û beralî dikin berpirsên Îranê ne. Dibêjin eşîr li dijî QSD'ê ne, lê ev rokêt û fuze ne karê eşîran e.

Herêma Dêrazorê yek ji herêmên dawî ye ku ji çeteyên DAIŞ'ê hatiye paqijkirin. Yek ji herêmên ewil e ku li dijî rêveberiya Şamê xwepêşandan û serhildan çêbûn. Gel bedelên pir giran dan. Niha li herêmê aramî û rêveberiyeke demokratîk heye. Di esas de xwe bi xwe rêve dibin. Ew bi awayekî têkiliyên xwe yên bazirganî bi aliyê din ê Firatê re, herêma ku di bin kontrola rejîmê de ye, didomînin. Ev jî tevkariya aboriya wî alî dike. Li gel vê jî hewldanên ku herêmê bikşînin nava rewşeke nakokî û kaotîk narawestin. Ev êrîş hem wêrankirina aborî bi xwe re tîne û hem jî ewlehiya jiyana gel dixe xeteriyê. Bêyî ku hewce bike gelek kesan jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn.

Li vê erdnîgariyê zêde qîmeta jiyana mirovan nîn e. Ji ber vê yekê mirov bi hêsanî tên xerckirin, tên kuştin û dişînin mirinê. Ji ber ku gel ne xwende û rêxistinkirî ye, ne di wê pozîsyonê de ye ku xwe biparêze û aliyê xwe diyar bike. Tirkiye hinekan ji wan dişîne Lîbya, Qerebax û hwd û wan ji bo xwe dide şerkirin. Di dagirkirina Sûriyeyê de, wan derdixe pêş. Ji bo ku leşkerên Tirk nemirin wan di eniyên pêş de digre.

Îran û Şam cuda nêzîk nabin. Lê belê Rêveberiya Xweser û QSD'ê dixwazin bi hikûmeta Şamê re danûstandinan bikin û pirsgirêkên xwe di nava yekîtiya Sûriyeyê de bi rengekî aştiyane çareser bikin. Ev hêz tiştekî ji Şamê naxwazin. Tenê Sûriyeke demokratîk dixwazin. Şam, li şûna vebijêrka demokratîk,zexta navendîbûna hişk a rejîma yek partî ya beriya 2011'an dike. Tirkiye jî, ji bo tinekirina Kurdan serî li her şêwe nebaşiyan dide. Gelo Tirkiyê tu daxuyanî li ser naskirina ti maf û nasnameyekê ji Kurdên Sûriyê re dîtiye? Na… Ji bo tinekirina Kurdan û temamkirina qirkirinê zexta li Şamê dike û teklîfan dike.

## Gêrîlayên Egîd



**Farûk Sakik**

15'ê Tebaxa 1984'an bû. Li navçeya Erûhê jiyanek normal hebû. Haya tu kesî jê tune bû hin şervanên Kurdan li derdora navçeyê, ji bo guhertina çarenûsa gelekê li benda saet 21.00 bûn û ew dem hat. 15'ê Tebaxa 1984'an li Erûhê, li dijî zilma dewleta tirk ya salan, deng bi çekan ket. Çalakî saetekê dewam kir. Di 10 xolekan de gihîştin hedefê xwe.

Egîd û rêhevalên xwe di mêjiyê dewletê de tirs û xof, di nava dilê kurdan de jî bawerî û hêviyên mezin hiştin û çûn. Dora rojê dengê vê fîşeka yekem li Kurdistan, Tirkiyê û li hemû cîhanê hat bihîstin. Bi vê çalakiyê hêviyên gel yên ku bi salan hatibûn windakirin, ji nû de zindî bûn.

Mîmarê teoriya 'fîşeka yekemîn' Dr. Frantz Fanon digot; "fîşeka ku gelên di bin mêtingeriyê de li dijî dijminê xwe diteqînin, di heman demê de li dijî tirsên xwe yên melisî, kesayetiya xwe yên bizdiyayî û vîna xwe ya şikestî jî diteqînin..."

Vê carê fîşeka yekemîn, ji aliyê yek ji gelên herî qedîm ê Rojhilata Navîn, ji aliyê gelê Kurd ve li dijî mêtingeriyê, di 15'ê Tebaxa 1984'an de hatibû teqandin û qereqolên ku mêtingeriyê di serê Kurdan de ava kiribû, rûxand. Bi fîşeka yekemîn ku 15'ê Tebaxa 1984'an de hatibû teqandin; jiyana gelê kurd ji nû ve hat dîzayinkirin. Di cîhana kurdan de hişmendiyeke nû, giyaneke nû û ramaneke nû afirand. Êdî tu tiştek weke berê nebû. Jiyaneke azad û civakeke nû hat afirandin. Betona ku li ser gora Kurd hatibû rijandin, bi vê fîşekê hatibû parçekirin. Kurdê ku axa mirinê ji ser xwe avêtibû, li hemberî kiryarên înkar û bêrûmetkirinê yên mêtingeriyê serî rakir, ji bo rometa xwe, ji bo azadiya xwe, ji bo avakirina jiyaneke azad, bi coş û wêrekiyeke mezin rabû ser piyan. Bi tûjitiya şûrê edaleta şoreşgerî, xwe ji xweliya xwe ji nû ve ava kir, ji bo hilanîna tolhildana sedsalan çi pêwîst bû kir. Hesabên dijminên dagirker serûbin bibûn. Ev serhildana dawî ya Kurdan, li gorî wan hinekî dijwar ajotibû. Gava li serhildanên din dinêrîn, di demeke kintir de encam girtibûn. Piştî 15'ê Tebaxê êdî li Kurdistanê hêzên Kurdan ên çekdarî hebûn. Roj bi roj zarokên Kurdan berê xwe didan çiya û tevlî van refên gerîla dibûn. Ev serhildan nedişibiya serhildanên beriya xwe. Ev yek jî dijmin har û çavsorî dikir.

Generalên mêtinger, temeneke 72 saetan dabûn vê serhildanê; lê saet bi rojan, roj bi mehan, meh bi salan bûhûrîbû, û serhildan jî her diçû mezin dibû. Ahaa, sal 2024 û ji wê hêzê hênjî darbeyên giran dixwe.

Îroj di encama nirxên 15'ê tebaxê de li çar aliyên Kurdistanê têkoşînek ji bo azadiya Kurdistanê tê meşandin. Îroj di encama wê çalakiyê de kurd li rojhilata navîn bûne hêviyên hemû gelan. Dema hêzên hegemon xwestin rojhilata Navîn ji nû de li gor berjewendiyên xwe yên nû dîzayin bikin. Lê dîtin hêzek li pêşiya wan astenge. Gerîlayên azadiya Kurdistan. Ji bo vê hêzê ji holê rakin serî li her cûre planî dan, lê bê encam man. Îroj di encama wê çalakiyê de li Rojavayê Kurdistan şoreşa ku pêk hat, mirovahî ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kir. Îroj bi rihê 15'ê Tebaxê gerîllayên kurdan, li çiyayên Kurdistan, li dijî dagirker û hevkarê wan, li dijî xiyanetê destanan dinivîsînin. Êdî dem dema şerê gerîlla ye. Gerîlla bi rihê 15'ê Tebaxê, Kurdistanê diparêze....